

Pêşgira Dariştinê ya “ra-”yê û Fonksiyonên Wê yên Morfosemantîk di Berhemên Klasîk ên Kurmancîya Jorîn da¹

Yukarı Kurmancî'nin Klasik Eserlerinde “ra-” Türeme Öneki ve Morfosemantik Fonksiyonu

The Derivational Prefix of “ra-” And Its Morpho-Semantical Functions In The Classical Works of Upper Kurmanji

Ahmet SEYARİ

Ahmet SEYARİ	Ahmet Seyari https://orcid.org/0000-0002-9388-8517 ehmedseyari@gmail.com Dr., Milli Eğitim Bakanlığı, Ankara - Türkiye
Jêgir Citation Atf	Seyari, A. (2024). Pêşgira Dariştinê ya “ra-”yê û Fonksiyonên Wê yên Morfosemantîk di Berhemên Klasik ên Kurmancîya Jorîn da. <i>Artuklu Kurdology</i> (17), 19-31
Dîroka Şandinê Submission Date Geliş tarihi	28.08.2024
Dîroka Qebûlê Acceptance Date Kabul Tarihi	28.09.2024
Dîroka Weşandinê Publication Date Yayın tarihi	30.09.2024
Cureyê Gotarê Article Type Makale Türü	Gotara vekolînê Research article Araştırma makalesi
Hakemî Peer-Review Hakemlik	Cot Nenas – Du ji derve Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
Beyana Etîk Ethical Statement Etik Beyanı	Haftîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsina vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têtûz hatine referanskirin <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunduğu beyan edilir.
Kontrola İntihalê Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	Belê – iThenticate <i>Yes – iThenticate</i> Evet – iThenticate
Nakokiyên Berjewendîyan Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye. <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
Alîkarîya Darayî Grant Support Maddi Destek	Nivîskar beyan dîke ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine. <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
Mafê Telifê & Destûr Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin. <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

1 Ev gotar bingeha xwe ji vê tezê digire: Seyari, A. (2023). Gireyên Dariştinê di Berhemên Klasik ên Kurmancîya Jorîn da (Teza Dokto-rayê). Zanîngeha Bîngolê, Enstîtûya Zimanên Jîndar.

This article is produced from the author's Ph.D thesis titled Derivational Affixes in the Classical Works of Upper Kurmanji

KURTE

Mijara vê xebatê pêşgira dariştinê ya “ra-”yê û fonksiyonên wê yên morfosemantîk in. Dariştin yek ji rêbaza peyv sazîyê ye. Di vê rêbazê da gireyêke dariştinê li morfemeke xweser zêde dibe û maneyêke nû lê bar dike. Carinan jî li rex maneyê cureya peyvê jî diguherîne. Xebat jî aliyê mijar, korpus û diyalektê ve hatiye sînorkirin. Ji bo vê xebatê wekî korpus Dîwana Melayê Cîzîrî, menzûmeyên Feqîyê Teyran (Şêx Sen’an, Bersisê ‘Abid, Zembîlfiroş, Şerê Dimdim) û Mem û Zîna Ehmedê Xanî hatine hilbijartin. Di xebatê da metoda zimannasîya senkronîk û teknîka analîzê ya zimannasîya kargîn hatine bikaranîn. Di vê çarçoveya analîzan da ji aliyê binyad û teşeyê ve peywend jî li ber çavan hatiye girtin. Wiha be çêtir e.. Di destpêka xebatê da metod, teknîk û çarçoveya xebatê hatiye destnîşankirin. Di beşa pêşî da derheqê bingeha teorîk a xebatê da agahî hatine dayîn. Di beşa analîzê da pêşî derheqê gireya “ra-”yê da agahî hatine dayîn û piştê peyvên ku ev gire wergirtine li gorî peywendê metnê hatine analîzkirin. Di encama xebatê da ev kategoriyên semantîk ên pêşgira “ra-”yê hatin tesbîtkirin: Bilindkirina tiştêkî û belavbûna deng, razan an jî hişyarbûn, destpêkirina rûdanekê û peywardarkirina kesekî, saxbûn û hatina bi ser hişê xwe û xurtkirina maneyê û şîyan.

Peyvên Sereke: Kurdî, Pêşgirên dariştinê, ra-, Kurmancîya jorîn, Berhemên klasîk.

ÖZ

Bu çalışmanın konusu Yukarı Kurmancî’de yer alan “ra-” türetme öneki ve morfo-semantik fonksiyonudur. Türetme kelime yapım tekniklerinden bir tanesidir. Bu teknikte bağımlı bir biçim birim bağımsız bir biçim birime eklenerek ona yeni bir anlam yükler. Bazen de anlamın yanında eklendiği kelimenin türünü de değiştirir. Araştırma konusu, korpus ve lehçe açısından sınırlandırılmıştır. Çalışmanın korpusu Melayê Cîzîrî’nin Dîvan’ı, Feqîyê Teyran’ın menzûmeleri (Şêx Sen’an, Bersisê ‘Abid, Zembîlfiroş, Şerê Dimdim) ve Ehmedê Xanî’nin Mem û Zîn adlı mesnevisinden oluşmaktadır. Bu çalışmada dilbilimin senkronik metodu ile ve dilbilimin işlevsel analiz tekniği kullanılmıştır. Bu çerçevede şekil ve yapının yanında bağlam da göz önünde bulundurulmuştur. Çalışmanın giriş bölümünde çalışmanın, metod ve tekniği hakkında bilgi verilmiştir. Çalışmanın birinci kısmında çalışmanın teorik altyapısı hakkında bilgi verilmiş. Analiz bölümünde ise önce türeme öneki olan “ra-” hakkında bilgi verilmiş daha sonra bu ekle türeyen kelimeler metindeki bağlam çerçevesinde analiz edilmiştir. Çalışmanın sonucunda “ra-” türetme önekinin şu semantik kategorileri tespit edilmiştir: Bir nesnenin yukarı doğru kaldırılması veya sesin yayılması, uyumak ve uyanmak, bir olayın başlaması, bir kişinin görevlendirilmesi, İyileşme veya ayılma, yetenek veya mananın güçlendirilmesi.

Anahtar Kelimeler: Kürtçe, Türetme öneki, ra-, Yukarı Kurmanca, Klasik eserler.

ABSTRACT

The subject of this study is the derivational prefix “ra-” in Upper Kurmanji and its morpho-semantic function. In this technique, a dependent morpheme is attached to an independent morpheme, giving it a new meaning. Sometimes, in addition to meaning, it also changes the type of word to which it is attached. The research is limited in terms of subject, corpus and dialect. The corpus of the study consists of Melayê Cîzîrî’s Dîvan, Feqîyê Teyran’s menzûmes (Şêx Sen’an, Bersisê ‘Abid, Zembîlfiroş, Şerê Dimdim) and Ehmedê Xanî’s masnavi Mem û Zîn. In this study, the synchronic method of linguistics and the functional analysis technique of linguistics were used. In addition to form and structure, context was also taken into consideration in this framework. In the introduction part of the study, information about the method and technique of the study is given. In the first part of the study, information about the theoretical background of the study is given. In the analysis section, firstly information about the derivational prefix “ra-” was given and then the words derived from this suffix were analyzed within the framework of the context in the text. At the end of the study, the

following semantic categories of the derivational prefix “ra-” were identified: Lifting something and making a sound, sleeping and waking up, the beginning of an event and the assignment of a person, healing or sobering up, strengthening ability or meaning.

Keywords: Kurdîsh, Derivational prefix, ra-, Upper Kurmanji, Classical works.

Destpêk

Mijara vê xebatê paşgira dariştinê ya “ra-”yê û fonksiyonên wê yên morfosemantîk e. Xebat ji aliyê mijar, korpus û dîyalektê ve hatiye sînorkirin û tenê li ser gireya dariştinê ya “ra-”yê hûr dibe. Ji bo vê xebatê wekî korpus Dîwana Melayê Cîzîrî², menzûmeyên Feqîyê Teyran³ û Mem û Zîna Ehmedê Xanî⁴ hatine hîlbijartin. Ev xebat bi metoda zimannasîya senkronîk (synchronic linguistics) û bi teknîka analîzê ya zimannasîya kargîn hatiye kirin. Di rêbaza modela senkronîk da lêkolîn li ser sîstem û binyada ziman tê kirin û ev rêbaz bêhtir li ser têkilîya di navbera yekeyên ziman da hûr dibe. Di çarçoveya metoda zimannasîya kargîn da jî li rex binyad û teşeyê rewş, peywend jî li ber çavan hatiye girtin. Ji ber ku ev xebat xwe dispêre rêbaza kargîn, gireyên peyvsaz li gorî peywendîya wan a di nav hevoksazîyê da û têkilîya wan a bi wan hêmanên din ra hatine analîzkirin. Jixwe ji ber ku xebat li ser teknîka kargîn ava bûye di analîza gireyên peyvsaz da, pêwendîya van gireyan bi hêmanên din ên di nav sentaksê da li ber çavan hatiye girtin.

Ji ber ku di xebatê da metoda zimannasîya senkronîk hatiye şopandin, di demeke dîyar da tenê şayesa sîstema ziman hatiye kirin û xebat ji aliyê demê ve bi sedsalên 16. û 17. û bi berhemên sê wêjevanan hatiye sînordarkirin. Xebat li ser guherîna ziman a dîrokî hûr nabe. Ji ber ku ew dikeve warê zimannasîya dîrokî û teknîka dîyakronîk dixwaze. Di vê xebatê da tenê di tesbîtîkirina etîmolojîya yekeyên maneyî da carinan gire hatine nîrxandin û maneya wan hatiye vegotin, lê bi şêwazeke dîyakronîk pêvajoyê û guherîna peyv û gireyan nehatiye ravekirin. Tenê gire û peyv ji aliyê morfolojîk, morfosentaktîk û morfosemantîk ve hatine analîzkirin. Xebat ne bi rêbaza zimannasîyê ya rêzîkparêz hatiye kirin lewre jî bikaranînên ziman ji aliyê rastî û şaşîyan ve nehatine nîrxandin. Ji ber ku ne xebateke rêzîmanî ye jî ji bo çêkirina peyvên rêbazek nehatiye pêşnîyazkirin. Tenê xebat hewl dide ku şayesandin û analîza rewş û bikaranîna ziman bike. Ji ber ku teknîka zimannasîya kargîn hatiye bikaranîn tenê binyad û teşe li ber çavan nehatiye girtin herwiha nîrxandin di çarçoveya peywir û peywendîya yekeyên ziman da jî hatiye kirin. Ji ber vê yekê jî peyv bi serê xwe li gorî cureyan nehatine kategorîzekirin berevajî wê, peyv li gorî peywira xwe ya di nav metnê da hatine dabeşkirin.

Rêbaz û teknîk ji xeynî rêbaza xebatê ji bo hîlbijartina nimûneyan jî diyarker. Yozgat vê taybetîyê wiha destnîşan dike:

Di teknîka teşeparêz da lêkolîner, nimûneyên xwe di çarçoveya bîryara axêverê zimanê zikmakî (native speaker judgements) da bixwe dinivîse û dema pêdivî bi hêçandina van nimûneyan çêbibe

2 Navê wî Ehmed e lê bi nasnavê Melayê Cîzîrî navdar bûye. Li bajarê Cîzîrê hatiye dinyayê (Zivingî, 2013, r. 17). Derheqê sedsala ku tê jîyaye nêrînên cuda hene lê di nav wan da ya ku zêdetir nêzî rastîyê ye sedsala 16. û 17. e. Helbest û menzûmeyên wî wekî dîwan gihane roja me. *Dîwana* wî di tarîxa edebiyata kurdî da yekem dîwan e ku bi awayekî murettab hatiye nivîsîn (Adak, 2015, r. 218).

3 Navê wî yê rastîn Muhammed e, Feqî wekî mexles bi kar anîye. Li gorî agahîyên ku ji helbestan tên derxistin, Feqîyê Teyran di sedsalên 16. û 17. da jîyaye (Yıldırım, 2014, r. 16). Feqî ji bajarê Miksê ye ku niha dikeve nav sînorên wîlayeta Wanê (Karadeniz, 2021, r. 9). Berhemên Feqî ji çar menzûmeyan (Şêxê Senan, Bersisê ‘Abid, Zembîlîfiroş û Şerê Dimdîm) û helbestên wî yên curbicur pêk tên (Adak, 2015, r. 238).

4 Ehmedê Xanî di 17. û 18. da jîyaye. Malbata wî mensûbê eşîreta Xanî ye. Malbata Xanî ji Hekarîyê koçî Bazîdê kiriye û Xanî li vir çêbûye (Yıldırım, 2014, r. 13). Berhemên wî ji “*Nûbihara Biçûkan* (1683)”, “*Eqîdeya Îmanê* (1687)” û mesnewîya wî ya bi navê “*Mem û Zînê* (1695)” û hin helbestên wî yên ku piştî wefata wî hatine berhev-kirin pêk tên (Tek, 2018, r. 7).

teknîka pirsyarîya bîryara rêzimanîyê (gramatical juggement survery) bi kar tîne û bi rêya pirsên ji axêverê ziman, analîzan dike. Ev nimûneyên lêkolîner wekî hevokên ku li ser maseyê hatine nivîsîn tînin binavkirin. Lêbelê di teknîka kargîn da rewş cuda ye. Di vê teknîka da lêkolîner li ser metnên rastîn, axaftinên rojane, qunciknivîsên rojnameyan û nûçe yan jî metnên edebî dixebite (Yozgat, 2018, r. 70-71).

Di vê xebatê da analîza peyvên a ji aliyê semantîk ve li gorî rêbaza nimînesazîyê hatiye kirin yanî zêdebûna gireyan çî guherîn di tîkîliya hêmana nimîner (signifier) û nimandî (signified) da pêk anîye ew hatiye analîzkirin. Ev analîz li gorî sê krîteran hatine kirin: Krîtera morfolojîk (morphological criteria), krîtera semantîk (semantic criteria) û krîtera morfosentaktîk (morphosyntactic criteria). Analîza ku erk û fonksiyona morfeman a di nav hevokê da li ber çavan digire analîza morfosentaktîk e. “Morfosentaks temsîliyeta morfolojîk a sentaksî jî îfade dike. Lewra jî digel maneya peyvê ya ferhengî rolên wê yên din jî derdikevin pêş” (Marif, 2014, r. 234). Di analîza morfolojîk da morfem tenê ji aliyê teşeyî ve tînin ravekirin, lê di analîza morfosentaktîk da erka morfeman li gorî erk û peywendê tê ravekirin. Ji bo ku cure, peywir û fonksiyonên gireyan baş bînin famkirin tenê zanîna taybetîyên morfolojîk têrê nake, divê rol û peywendê peyvê ya di nav risteyê da jî bînin zanîn.

1. Morfem

Morfem hêmanên sîstema ziman ên herî piçûk in û aîdê dirkandina yekem (first articulation) in (Aydın, 2014, r. 73). Morfem û peyv ne heman tişt in. Dibe ku carinan peyvek ji morfemê jî pêk bê, lê hin morfem jî peyvê piçûktir in. Yanî her peyv di heman demê da dibe morfem (morfemên serbixwe), lê her morfem ne peyv e. Carinan jî morfem jî gireyan jî pêk tînin (morfemên bendî). Ev hêmanên ku wekî teşeyên sîstema ziman xuya dibin li gorî Ahanov (2021, r. 65) jî tîkelbûna deng û maneyê pêk tînin. Bloomfield morfeman wekî dendikên peyvên ên binyadî terif dike ku nikarin dabeşî parçeyên piçûktir bibin. Yanî morfem yekeyên dabeşnebar (uninterruptability) in (1935, r. 161). Li gorî mane û fonksiyona xwe cureyên morfeman hene. Ji ber ku morfem aîdê sîstema ziman a yekem in û firaz û riste aîdê sîstema ziman a duyem yanî gotinê ne, hin jî wan xwedîyê maneyê ferhengî û hin jî wan jî xwedîyê maneyê rêzimanî ne (Guzev, 2010, r. 45). Morfem jî her wekî fonem û bejêyên ferhengî (lexeme) lekseman sînordar in ne wekî firaz (phrase) û risteyan (sentence) bêsînor in.

Hin morfem herçiqas xwedîyê mane û peywirê jî bin bi deng û şeweyeke cuda xwe nîşan didin. Ev cureyên morfeman wekî alomorf (allomorph) tînin binavkirin (Brinton, J, Brinton, M., r. 90-91; Aydın, 2014, r. 75). Bi gotineke din alomorf veguhastina hêmana morfemê ye ku bi teşeyêke cuda pêk tê û heman maneyê bi teşeyêke cuda vediguhêze (Plag, 2003, r. 27; Toklu, 2009, r. 54). Cureya din a morfeman, morfemên sifir (zero morpheme) in. Ew morfem bi awayekî teşeyî nayên nîşandan (Bloomfield, 1935, r. 209) û di wan da hêmana nimandî heye, lê ya nimîner tune ye.

Morfem li gori rewşê wekî morfemên serbixwe (free morphemes) û morfemên bendî (bound morphemes) dabeş dibin. Morfemên bendî jî morfemên çemandinê (inflection morphemes) û morfemên dariştinê (derivational morphemes) pêk tînin. Herwiha morfemên serbixwe jî ji morfemên rêzimanî û morfemên ferhengî pêk tînin. Gelek caran tîgîhên morfem û gireyan (affix) li cihê hev tînin bikaranîn lêbelê herdu ne heman tişt in. Lewra morfem jî gireyê berfirehtir e û wê di nav xwe da dihevine. Yanî morfem hem jî gireyan hem jî ji peyvên sade (simple words) pêk tînin. Morfemên bendî gire û morfemên serbest jî peyv in.

1.1. Morfemên Dariştinê (Derivational Morpheme)

Dariştin pêvajoya morfolojîk e û bi vê pêvajoyê jî peyveke heyî peyveke nû tê sazîkirin. Morfemeke bendî li morfemeke serbixwe zêde dibe. Dariştin di heman demê da pêvajoyêke semantîk e jî. Ji ber ku

li rayeka peyvê yan jî gewdeyê wê gireyek zêde dibe û li ser mane peyvê yan jî cureya wê guherîne pêk tîne û bi vî awayî jî peyveke heyî peyveke nû saz dibe.

Yekeyên ziman bi hev ra di nav girêdan û peywendekê da ne. Ev yeke yan hêmanên dorhêlî ne ku xelesa gotinê pêk tînin yan jî rasterast bi wan parçeyan ve girêdayî ne ku van yekeyan pêk tînin. Dariştina peyvan nişana vê rewşê ye. Wekî nimûne, di peyva “dil+dar”ê da ev her du morfem, ne du hêman in ku ji hev bêleqe ne; her du hêman bi hev ra û di nav têkilî û peywendekê beramber da biqîmet in. “Di dariştinê da çavkanîyek heye. Lewra ji hêmaneke heyî hêmaneke nû zahir dibe mesela di wan rêbazên din ên peyvsazîyê da çavkanîyêke esas tune ye. Ji ber vê yekê ew rêbazên din nabin dariştin “(Sarı, 2015, r. 47). Di dariştina peyvan da du fonksiyonên sereke hene: yek jê guherîna maneyê ya din guherîna cureya peyvê (word class) ye. Carinan jî bêyî ku cureyê biguherîne ji aliyê peywira peyvê ve wê diguherîne û tesîra wê li ser bincureyê (sub-typ) peyvê çêdibe (Bauer, 2004, r. 6). Dibe ku carinan yek ji van peywiran pêk bê yan jî her du bi hev ra. Di erka duyem da fonksiyonên wekî sazîkirina navdêr, hevalnav, kar û hevalkaran pêk tê. Wekî Sebzecioğlu jî destnîşan dike dabeşkirina cureyên peyvan her car ne hêsan e. Bi taybetî cureyên navdêrî (nominal) di gelek warên bikaranîne da hevpar in. Lewra jî zimannasan ew wekî yên prototîp û yên neprototîp dabeş kirine. Li gorî vê dabeşkirinê yên navdêrî, r. navdêr, cînav, hevalnav û hevalkar û yên din: kar, gihanek, daçek û baneşan in (2017, r. 297) û yên din jî kar in.

Gelek caran sînoren peyvên dariştî û sade baş ne kifş e. Ji ber ku hin peyv hene ku ji du morfeman pêk hatine lê di pêvajoya demê da hin morfeman forma xwe ya xweser winda kiriye û di semantîka wan da guherîn çêbûye. Lewra jî her du peyv bûne wekî yek morfemê. Divê bê zanîn ku ew peyv di zimanê siruştî da bi serê xwe tê bikaranîn an na. Muhammed van peyvan wekî peyvên parvebar û serbixwe bi nav dike û li ser nimûneya peyva “şivan”ê wiha şirove dike:

Tarîxiyên şivan peyveke parvebar bû. Bo nimûne, di avestayî da ew bi şiklê ‘pşupane’ bû ku ji peyvên ‘pşu’ (pez) û ‘pane’ (parstin)ê pêk dihat û bi zelalî peyveke aloz û parvebar (pêkhatî) bû. Lê di kurdî da tu peyveke serbixwe bi şiklê ‘şi’ nîne û tu maneyê nade. Paşgira ‘-van’ê jî nikare bi tenê wekî peyveke serbixwe be. Loma peyva “şivan” di kurdî da êdî peyveke sade û parvebar e. (2016a, r. 10).

Di zimanê îngilîzî da hem pêşgir hem jî paşgir bi hev ra yan jî cuda cuda di dariştina peyvan da tîne bikaranîn (Plag, 2003, r. 11). Di zimanên din da jî (wekî tirkî) peyv tenê dikarin bi paşgiran bîne dariştin. Di hin zimanan da navgir jî tîne bikaranîn û bi zêdebûna navgiran li rayek an jî gewdeyên peyvan (morfemên serbixwe) peyvên nû tîne dariştin. Di kurmancîya jorîn da jî bi pêşgir û paşgiran peyv tîne dariştin û ev kar bi morfemên dariştinê pêk tê.

Morfemên dariştinê ew morfem in ku li yekeyên manedar zêde dibin û li ser mane, cure yan jî hem mane hem cureyê tesîrê dikin. Morfemên dariştinê wekî gireyên dariştinê jî tîne binavkirin. Lewra morfemên ku bi karê dariştinê radibin gire ne. Ahanov taybetîyên morfemên dariştinê û cudahiya wan ji yên kêşanê destnîşan dike û wiha dibêje: Gireyên dariştinê bereksê yên kêşanê bi heman awa û fonksiyonê nikarin li hemû cureyên peyvan zêde bibin û dema li rayeka peyvê zêde dibin ew û rayek bi hev ve dikelîjin û dibin wekî yek hêman û ew gire dibe endameke wê peyvê (2021, r. 282, 284).

Ji ber ku her morfema dariştinê ne li ser maneya rayekê lê li ser maneya dawî ya gewdeya peyvê tesîrê dike du yan jî zêdeyî du morfemên dariştinê di heman demê da li peyveke sade zêde nabin (Turan, 2018, r. 103). Mesela peyva “dildarî”yê hem morfema dariştinê ya “dar”ê hem ya “-î”yê wergirtiye. Di vê peyvê da paşgira dawî (-î) ne li ser maneya peyva “dil”ê belkî li ser maneya peyva “dildar”ê tesîr kirîye. Morfemên dariştinê bi serê xwe nayên bikaranîn li morfemên din zêde dibin. Ev rewşa ziman jî wekî bigirebûnê (affixation) tê binavkirin (Bloomfield, 1935, r. 218). Ji van, ên ku peyvên nû saz dikin jî gireyên dariştinê ne. Gireyên dariştinê li gorî cihê ku li rayeka peyvê yan jî gewdeyê wê zêde dibin sê cure ne: pêşgir, paşgir û navgir. Bigirekirina herî berfireh paşgir e (Uzun, 2006, r. 35).

Ji van gireyan ên herî berbelav paşgir in û piştî paşgirê jî herî zêde pêşgir tên bikaranîn. Hem paşgir hem jî pêşgir di gelek zimanan da hene û tesîrê li ser kategorîya peyvên dikin yanî dikarin cureya peyvê biguherînin” (Stekauer û yd., 2012, r. 136). Wekî din jî ev gire di peyvên da li rex maneyê guherîna fonolojîk û kirpandinê (stress) jî pêk tînin û carinan jî cureya peyvê diguherînin. “Di ziman da rêjeya bikaranîna hemû gireyan dariştinê ne wekî hev e. Hinek ji wan jî yê din bêhtir fonksîyonel in. Ev taybetî wekî berhemdariyê (productivity) tê binavkirin” (Plag, 2003, r. 44).

Hinek gire serê pêşî wekî peyv in û di pêvajoya demê da bûne gire (Hatipoğlu, 1974, r. 331). Yanî morfemeke serbixwe ya ferhengî piştî demê bi peywira rêzimanî hatiye bikaranîn û bûye morfemeke bendî. Ev bûyer di zimannasîyê da wekî rêzimanîbûn (grammaticalisation) tê binavkirin (Demirci, 2008, r. 132).

Du erkên sereke yê morfemên dariştinê hene: Yek ya morfelojîk ya din a morfosemantîk e. Fonksîyona morfolojîk ew fonksîyona rêzimanî ye ku binyada yekeyên ziman a teşeyî îfade dike, lê fonksîyona morfosemantîk ew erk e ku bi rêya yekeyên ziman maneyekê li morfeman bar dike. Bi gotineke din ew pêwendîya semantîk e ku di navbera peyvê û morfema dariştinê da bi erka maneguherîyê li kar e. “Fonksîyona morfolojîk diyar û sîncard e, lê ya morfosemantîk berfireh û muxleq e” (Varol, 2022, r. 276). Morfosemantîk di heman demê da “dîsîplîneke zimannasî û şaxeke manenasîyê ye ku wê erka maneyî vedikole ku bi rêya gireyan li peyvên bar bûye” (Akçataş û Varol, 2021, r. 413).

1.2. Pêşgirên Dariştinê

Pêşgirên dariştinê ew morfemên bendî ne ku ji bo morfemeke nû saz bikin tên pêşîya morfemên serbest. “Ev pêvajoyê di zimannasîyê da wekî bipêşgîrebinê (prefixation) tê binavkirin” (Uzun, 2006: 35). Hin pêşgir tenê maneya peyvê, lê hinek di heman demê da cureya peyvê jî diguherînin.

“Bi rêya pêşgiran bêyî ku peyvek ji kokê ve bê afirandin maneyekê nû li peyva heyî tê zêdekirin. Ev rewş derfetê dide ku têgihên nû bîn sazkin û li ferhenga ziman zêde bibin” (Delikaya, 2016, r. 42). Li gorî Hamawand Întegrasyona (entegration) pêşgir û rayekê ji aliyê çar faktorên ve tê kontrolkirin: Ya yekem karîgerîya pêşgirê ya semantîk û fonolojîk e, ya duyem pabendîbûna pêşgir û serbixwebûna rayekê ye û ya sêyem tevgera pêşgirê ye ku rayeka temamker e, lê wekî diyarê profîlê tev digere û ya çarem jî rola temsîlkirina peyvê ye (2011, r. 55).

Pêşgir cureyê morfemên bendî ye. Hin ji wan bi naverok û hin ji wan jî bê naverok in. Pêşgirên peyvsaz bi serê xwe ne xwedîyê maneyekê tekûz in, lê piştî ku tîna pêşîya morfemeke serbixwe yanî peyveke binaverok û serbixwe maneyekê nû li wê peyvê bar dikin. “Ev gire carinan jî li rex maneyê tesîrê li ser kategorîya peyvên jî dikin yanî dikarin cureya peyvê biguherînin” (Stekauer, Valera û Körtvelyessy, 2012, r. 136). Kurdo derheqê pêşgiran da wiha dibêje: Pêşpirtik digihin navên heyî, bi wan ve dizeliqin û bi vî awayî fikra wan diguherînin û xeberên teze çêdikin (1981, r. 23).

Hin pêşgir bi heman teşe û morfolojîya xwe bi awayekî xweser tîna bikaranîn lê di fonksîyon û maneyên cuda da ne. Pêşgirên wekî “bi-”, “bê-”, “ne-”, “ra-” û “ve-”yê hem wekî morfemên serbest tîna bikaranîn hem jî wekî morfemên bendî tîna bikaranîn. Dema bi awayê xweser tîna wekî daçek tîna bikaranîn û dema bi awayê bendî tîna fonksîyona dariştinê tînin. Morfemên wekî “jê”, “lê”, “pê” jî ber ku bi serê xwe, bi awayekî xweser jî di kurdî da tîna bikaranîn ne gireyan dariştinê ne; peyv (morfemên serbixwe) in. Wekî Ebdulfettah jî dibêje: “Ev peyv ji kurtkirin û pevxistina cînavên nîşandanê û kesîna (vî/vê, wî/wê) û daçekan (bi, ji, li) pêk hatine” (2011, r. 74).

2. Gireya Dariştinê ya “ra-”yê û Fonksiyonên Wê yên Morfosemantîk

Morfema “ra-”yê di kurmancî da hem wekî pêşgirekê di foksîyona peyvsazîyê da hem jî wekî paşdaçek tê bikaranîn. Lê ev pêşgir bi fonksiyona gireya dariştinê maneyên hêz, pêşvebirin û pêşxistinê li peyvan bar dike (Tîgrîs, 2011, r. 25). Ev pêşgir maneya liv û tevgerê dide ku carinan ber bi jor ve û carinan jî ber bi jêr ve pêk tê. Mesela li hin karan “Maneya ber bi jor hilbûneke şaqulî û kişîn û belavbûneke asoyî bar dike” (Zilan, 2006a, r. 12). Dema pêşgira “ra”yê li karên sade zêde dibe maneya arastebûna ber bi tiştê ve, tevgera berzî û stûnîyê (rabû) yan jî nizmîyê (rakêşa) dide wan. Herwiha maneya borîn û bidawîbûna demê û lêhûrbûnê dide rayeka karan (Usman, 2015, r. 73). Pêşgira “ra-”yê tê pêşîya kara rayeka dema borî û dema niha. Ji aliyê semantîk ve jî maneyên cuda li karan bar dike. Herçiqaş pêşgira “ra-”yê tevgerê ber bi hêla jorîn ve îfade bike jî ev fonksiyona wê li gorî peywendê ji aliyê semantîk ve diguhere û li lêkaran maneyên cuda bar dike.

Di metnên klasîk da ji aliyê morfolojîk ve ev pêşgir karan saz dike. Hem tê pêşîya rayeka karê ya dema borî hem jî ya dema niha û ji aliyê semantîk ve maneyên nû li karên ku li wan zêde bûye bar dike. Maneyên wekî hilbûna ji cih, bilindkirina tiştê û belavbûna deng, razan an jî hişyarbûn, destpêkirina rûdanekê û peywardarkirina kesekî, saxbûn û hatina ser hişê xwe, xurtkirina maneyê û şiyane bi vê pêşgirê li rayekên karan bar bûye.

2.1. Hilbûna ji Cih

Di metnên klasîk da pêşgira “ra-”yê hem li rayekên karên dema borî (rabû) hem li yên dema niha (rabin, rakit) zêde dibe. Ji aliyê semantîk ve jî dema ev pêşgir tê pêşîya rayeka karan maneya rabûna li ser pêyan û hilbûna mirovekî ya ji cih li wan bar dike.

- (1) a. “Zanî bi te‘emmul û bi îdrak/ **Rabû** ji cihê xwe çist û çalak”(Xanî, 2014, r.88).
- b. “Ew jî ji wî halî bû xebardar/ **Rabû** ji cihê xwe ew xerezdar” (Xanî, 2014, r. 137).
- c. “Fîl hal dibê **rabin** ji nik/ Şox û şepala sur ji rav” (Cizîrî, 2019, r. 148).
- d. “**Rakit** qiyam wê saetê/ Alem bibit zîr û zeber” (Cizîrî, 2019, r. 107).

Di nimûneyên jorîn da, di (1a-b)yê da bi pêşgira “ra-”yê kara “rabûn”ê hatiye dariştin. Di vir da pêşgira dariştinê li rayeka kara dema borî ya “bûn”ê zêde bûye û di maneya wê da guherîn pêk anîye. Di madeyên (1c-d)yê da karên ku bi vê pêşgirê hatine dariştin di metnê da wekî “rabin” û “rakit” derbas dibin. Ev her du kar di forma dema niha da ne. Dema pêşgira dariştinê û gireyên kesane ji van tînan avêtin rayeka karan wekî “b” û “k” dimîne. Rayeka van karan a dema borî “bûn” û “kirin” e. Ji aliyê semantîk ve pêşgira “ra-”yê maneya hilbûna ji cih a ji nişka ve li rayeka van karan bar kiriye.

2.2. Bilindkirina Tiştê û Belavbûna Deng

Pêşgira dariştinê ya “ra-”yê dema li rayeka karan a dema borî zêde dibe ji van rayekan karên nû dadirêje. Di metnên klasîk da karên “rahiştin”, “rabûn”, “ragirtin” û “rakirin”ê bi vî awayî hatine dariştin. Di van karan da pêşgira dariştinê ji aliyê semantîk ve maneya bilindbûna tiştê yan jî belavbûna deng daye rayeka karan.

- (2) a. “Şeytan bûwe cintazîyek/ **Rahişt** di guh da gazîyek” (Feqî, 2017, r. 360).
- b. “Go can ku ji hebsê ten cuda bû/ Feryad û fixan ji şehri **rabû**” (Xanî, 2014, r. 182).
- c. “Ma Melayî ez lebê le’l abê heywan bit nesîb/ Qudsîyan **ragirtine** destê du’ayê rast û çep” (Cizîrî, 2019, r. 62).

- d. “Şahê Erebi ‘elem ku **rakir**/ Kisrayê ‘Ecem ‘eceb duta kir” (Xanî, 2014, r. 13).
- e. “Germiyetê narê qurbê meqsûd/ **Rakir** ji wucûdê ‘aşiqan dût” (Xanî, 2014, r. 86).
- f. “Resikîn du ‘eded nihâlê serkeş/ **rabûn** bi hewa ve her du serxweş” (Xanî, 2014, r. 194).

Di nimûneya (2a)yê da ev pêşgir hatiye ber kara “hiştin”ê. Li gorî bikaranînê maneyên cuda yên peyva “hiştin”ê hene. Ji van maneyan ên sereke ev in: “Terkkirina cihekî yan jî kesekî, neguherîna rewşê, yan jî hilanîna tiştêkî (Farqînî, 2005, r. 851). Piştî ku pêşgira “ra-”yê hatiye ber vê karê maneyên nû lê bar kirine. Ev peyv di metnê da, bi maneya gazîyê yanî deng û bangê hatiye bikaranîn. Herwiha bi vegotina “rahişt di guh da gazîyek”ê bangkirina di ber guh da hatiye qesdkirin. Di nimûneya (2b)yê da jî heman mane derdikeve pêş. Di vir da jî ji bo bilindbûn û belavbûna dengê feryad û fixanê kara “rabûn”ê hatiye gotin. Rayeka vê karê (bû-) bi serê xwe tê maneya pêkhatin û rûdanê, lê pêşgirê maneya bilindbûnê daye vê karê û bi vî awayî kareke nû dariştîye. Di nimûneya (2c)yê da kara “ragirtin”ê ji kara “girtin”ê hatiye dariştin. Maneya ferhengî ya karê “girtin”ê zeftkirin yan jî zîndankirin (Botî, 2006, r. 282). Lê bi zêdebûna vê pêşgirê maneya bilindkirinê wergirtiye. Lewra di metnê da ev kar di nav îfadeya “ragirtine destê du’yê” da bi maneya bilindkirina destan hatiye bikaranîn. Di nimûneya (2d)yê da kara dariştî “rakirin” e. Ev kar jî ji rayeka kara “kirin”ê hatiye dariştin. Maneya vê karê ya ferhengî pêkanîna karekî ye (Zaxoyî, 2007, r. 115), lê bi wergirtina vê pêşgirê maneya bilindbûnê lê zêde bûye. Di vir da kara dariştî di metnê da wekî “rakir” derbas dibe û maneya bilindkirina alayê daye metnê. Di nimûneya (2f)yê da ev pêşgir li kara “bûn”ê zêde bûye û kara dariştî “rabû” saz bûye. Di vir da pêşgirê maneya bilindbûna “nihalan” (şaxan) daye beytê.

2.3. Razan an jî Hişyarbûna ji Xewê

Pêşgira “ra-”yê dema berî rayeka karên “bûn” û “ketin”ê tê ji van rayekan karên nû saz dike û di maneya wan da guherînê pêk tîne. Rayekên karên ku ev pêşgir li wan zêde dibe di forma dema borî da ne. Di berhemên klasîk da peyvên “raket” û “rabû”yê bi vî awayî hatine dariştin.

(3) a. “Îşq agir e ma sar dibî/ Hingî diçû dijwar dibî/ Şêx pê ze’îf û jar dibî/ Çend rojekan ma **raketê**” (Feqî, 2017, r. 266).

b. “**Rabûn** ku şevêk siyah û tarî/ Şems û qemeran kirî tewarî” (Xanî, 2014, r. 50).

Di nimûneya (3a)yê da kara “raketin”ê ji morfema “ra-” û “ketin”ê pêk tê. Di vir da pêşgir li rayeka karê ya dema borî “ketin”ê zêde bûye. Vê pêşgirê cureya peyvê neguherandiye, lê li ser maneya wê tesîr kiriye. Lewra maneya vê karê ketina tiştêkî ji jor ber bi jêr ve ye yanî tevgerê ber bi hêla jêrîn ve ye, lê bi zêdebûna pêşgirê karê maneya razanê wergirtiye. Di nimûneya (3b)yê da peyva ku hatiye dariştin kara “rabûn”ê ye, ev peyv jî ji rayeka kara dema borî ya “bûn”yê hatiye dariştin. “Maneya ferhengî ya kara ‘bûn’ê rûdan û qewimîn e” (Botî, 2006, r. 121, 565), lê di vê mînakê da ‘rabûn’ maneya hişyarbûna mirovekî ya ji xewê daye metnê û ev guherîna maneyê bi pêşgirê li karê bar bûye.

2.4. Destpêkirina Rûdanekê û Peywirdarkirina Kesekî

Di metnên klasîk da, dema pêşgira “ra-”yê li rayeka hin karan zêde dibe maneyên destpêk û rûdana bûyerekê yan jî peywirdarkirina mirovekî ya ji bo kirina karekî li wan bar dike. Rayekên karan ên ku vê pêşgirê werdigirin carinan di forma dema niha da ne carinan jî di forma dema borî da ne. Karên “rabitin”, “rabû” û “ragirtin” bi vî awayî hatine dariştin.

(4) a. “Narê surre peyda bitin/ Bayê mecaz lê **rabitin**” (Feqî, 2017, r. 280).

b. “Go padîşehêk zemanê sabiq/ **Rabû** di hukûmeta xwe fa’iq” (Xanî, 2014, r. 32).

c. “**Ragirt**-i ji bo xwe dergevanek/ Fetta nê zemanê seypisanek” (Xanî, 2014, r. 93).

Di nimûneya (4a)yê da kara dariştî ya “rabitin” di forma dema niha da ye. Lewra dema ji vê kara dariştî pêşgira dariştin û gireya kesê sêyem bê avêtin rayeka karê tenê wekî “b”yê dimîne (ra-b-in). Ji aliyê semantîk ve jî pêşgira dariştinê maneya destpêka rûdanê li rayeka karê zêde kiriye. Di nimûneya (4a)yê da kara dariştî “rabitin” ji bo destpêka wezîna bayê hatiye bikaranîn. Di madeyên (4b-c)yê da rayekên karan ên ku ev pêşgir li wan zêde bûye di forma dema borî da ne. Di nimûneya (4d)yê da ev pêşgir li rayeka kara “bûn”ê bar bûye û kara dariştî ya “rabûn”ê saz bûye. Di vir da kara dariştî maneya destpêka serwerî û desthilatîya padîşahêkî ya li welatekî daye metnê. Di nimûneya (4d)yê da pêşgira “ra-”yê li kara “girtin”ê bar bûye. Di vir da bi vê pêşgirê kara “wergirtin”ê saz bûye. Ev kar di metnê da bi wê maneyê hatiye bikaranîn ku peywardarkirina kesekî û wergirtina wî ya ji bo kar anku tayînkirina wî îfade dike.

2.5. Saxbûn û Hatina bi ser Hişê Xwe ve

Dema pêşgira “ra-”yê li rayeka karên “ketin” û “bûn”ê zêde dibe maneyeke nû li wan bar dike. Ev karên ku bi vê paşgirê tîni dariştin ji aliyê morfolojîk ve carinan di forma dema niha (radibin) û carinan jî di forma dema borî (raket) da ne. Ji aliyê semantîk ve karên ku bi vê pêşgirê saz dibin maneyên vejîna kesekî mirî, başbûn û bidestxistina tenduristîyê û hatina bi ser hişê xwe ve li metnê zêde dikin.

(5) a. “Yek canî ji dijminan cuda ket/ Ya dî miriyan ji nû ve **raket**” (Xanî, 2014, r. 158).

b. “**Şêx go hekîm** ‘Îsa bitin/ **Loqman ji qebrê rabitin**” (Feqî, 2017, r. 261).

c. “Îhsan bike her duwan dewa ke/ Derman ke bi new’ekî tu **rake**” (Xanî, 2014, r. 66).

d. “Bêhiş dikevin gelek dimînin/ Gava weku **radibin** di dîn in” (Xanî, 2014, r. 62).

Di nimûneyên jorîn da, di nimûneya (5a-b)yê da karên “raket” û “rake” bi pêşgira “ra-”yê hatine dariştin. Di van nimûneyan da ev kar bi awayê “...miriyan ji nû ve raket” û “...ji qebrê rakin” derbas dibin û maneya vejîna kesekî mirî daye metnê. Di nimûneya (5c)yê da peyva dariştî ya ku bi vê pêşgirê saz bûye kara “rake” ye. Ev kar di vir da, bi maneya başbûn û saxbûna kesekî nexweş yanî bidestxistina tenduristîyê hatiye bikaranîn. Di nimûneya (5d)yê da peyva dariştî “radibin” e. Ev peyv di vir da wan kesan îfade dike ku berê bêhiş ketine û paşî hatine ser hişê xwe. Lewra di risteya pêşî ya vê malikê da îfadeya “Bêhiş dikevin...” derbas dibe û kara “rabûn”ê ji bo van kesan hatiye bikaranîn.

2.6. Xurtkirina Maneyê û Şiyan

Pêşgira “ra-”yê carinan dema li rayeka karan zêde dibe maneya wan bi temamî naguherîne, tenê maneya ku di karê da heye xurt dike. Carinan jî ev pêşgir maneya karîn û şiyane dide rayeka karê. Di metnên klasîk da karên dariştî yên “radihejinî”, “radimûsa” û “ragiri”yê vê maneyê li metnê zêde dikin.

(6) a. “Hubba te ye min **radihejinî** ku binalim” (Cizîrî, 2019, r. 109).

b. “Evcende pêkve **radimûsan**/ Nobet nedidane hev li bûsan” (Xanî, 2014, r. 89).

c. Remzek xerîbê fatirî/ Peyda bibit nêv xatirî/ Quwwet tê nînin **ragirî**/ Xef kî di nêv qelbê xwe da (Cizîrî, 2019, r. 107).

Di nimûneyên jorîn da, di madeyên (6a-b)yê da pêşgira dariştinê ya “ra-”yê li rayeka karên “hejîn” û “mûsîn/bûsîn”ê zêde bûye. Ji aliyê morfolojîk ve her du kar ku di forma dema niha da ne; ji aliyê maneyê ve jî pêşgirê maneya van karan xurt kiriye. Kara “hejîn”ê tê maneya livandin û lerizandina tiştêkî yan jî kesêkî. Herçiqas di kara “rahejîn”ê da heman mane hebe jî di vir da pêşgira “ra-”yê maneya hejandineke xurttir û diwartir daye karê. Di nimûneya (6b)yê da bi vê pêşgirê kara “radimûsan”ê hatiye dariştin. “Pêşgira ‘ra-’yê dema tê peşîya peyva kurdî ya ‘mijîn’, ‘misîn’, dibe ‘ramûsîn’” (Kerim, 2019, r. 497). Di vir da guherîna deng pêk hatiye. “Di kurdî da wekî di peyva “misilman/bisilman” da xuya dike tîpa b/m bi hev diguherin (Malmîsanîj, 2013, r. 75). Di nimûneya (6c)yê da pêşgira dariştinê hatiye ber kara “girtin”ê ya di forma dema niha da. Di vir da peyva dariştî ya “ragirtinê”ê di maneya karîn û şîyanê da hatiye bikaranîn. Lewra di vê beytê da vê peyvê maneya têrîkirina qeweta mirovekî ya ji bo pêkanîna kar û tevgerêkê daye metnê.

Encam

Pêşgira “ra-”yê di metnên klasîk da ji aliyê morfolojîk ve karên nû saz dike. Hem tê peşîya rayeka karê ya dema borî hem jî ya dema niha û ji aliyê semantîk ve maneyê nû li karên ku li wan zêde bûye bar dike. Maneyên wekî hîlbûna ji cih, bilindkirina tiştêkî û belavbûna deng, razan an jî hişyarbûn, destpêkirina rûdanekê û peywirdarkirina kesêkî, saxbûn û hatina ser hişê xwe, xurtkirina maneyê û şîyanê bi vê pêşgirê li rayekên karan bar bûye.

Di çarçoveya van encaman da mirov dikare balê bikişîne ser van taybetîyan û ji bo lêkolînê vê qadê van pêşniyazan bike: Gireyên dariştinê yên kurmancîya jorîn ji aliyê semantîk ve ne xwedîyê yek fonksiyonê ne. Heman gire li gorî peywendê, maneyên cuda li morfeman bar dikin. Ji ber vê yekê jî divê di xebatên dariştinê da nirxandinên giştî yên wekî: “filan gire filan maneyê dide” neyên kirin û divê analîza gireyan ne bi rêbaza teşeparêz, bi rêbaza kargîn bê kirin bi vî awayî dê hemû fonksiyonên semantîk ên gireyan baştir bê famkirin.

Ji ber ku ev xebat ne bi rêbaza rêziman ya rêzîkparêz, bi rêbaza diskriptîf û şayesî hatiye kirin li ser rastbûn û şaşbûna gireyan nirxandin nehatine kirin û ji bo çêkirina peyvên nû pêşniyaz nehatine kirin. Di xebatê da tenê fonksiyonên gireya dariştinê ya “ra-”yê hatiye analîzkirin. Ev kategoriyên fonksiyonên vê gireyê dibe ku ji xebatên nû yên di warê dariştina peyvên da bibe alîkar. Wekî mînak, di malika “Ragirt-i ji bo xwe dergevanek/ Fattanê zemanê seypisanek”ê (Xanî, 2014, r. 93) da bi pêşgira “-ra”yê peyva “ragirtinê” hatiye dariştin û di vir da vê pêşgirê girtina mirovekî ya ji bo kar û peywirdarkirina wî li peyvê bar kiriye ku ev fonksiyona gireyan dikare ji bo dariştina peyvên nû yên bi vî awayî bê bikaranîn. Di vê çarçoveyê da tê pêşniyazkirin ku kes yan jî lijneyên ku li ser çêkirina peyvên dixebitin divê berhemên klasîk li ber çavan bigirin. Berî ku bi gireyêkê dariştinê peyvekê bê çêkirin eger kategoriyên wê gireyê yên morfosemantîk li ber çavan bên girtin karê dariştina peyvên nû hêsantir û durustir bibe.

Ev xebat li ser metnên sê helbestvanên klasîk hatiye kirin û ji aliyê dem û metnên xebatê ve sînaordar e. Ji ber ku ziman jî wekî hêmaneke zindî ye û di pêvajoya demê da tê da guherin çêdibin ji bo hemû kategoriyên semantîk ên gireyên dariştinê bên tesbîtkirin û şayesandina û taybetîya van gireyên ravekirin divê di vî warê da ji xeynî metnên klasîk li ser metnên wan qadên din jî xebat bên kirin.

EXTENDED ABSTRACT

The subject of this study is the prefix “ra-” and its morphosemantic functions. The study is limited in terms of corpus and dialect. The derivational function of the suffix “ra-” is emphasized here. This suffix morphologically derives new verbs in classical texts. It is attached to both present and past tense roots and semantically gives a new meaning to these verbs. The study is limited to Upper Kurmanji as a dialect and the first works of Classical Kurdish Literature as a corpus. These works include Melayê Cizîrî’s Dîvan, Feqîyê Teyran’s four poems (Şêx Sen’an, Bersisê Abid, Zembîlîroş, Şerê Dimdim) and Ehmedê Xanî’s Masnavi Mem û Zîn.

In this study, the synchronic linguistics method and the functional analysis technique of linguistics were used. In the synchronic model, the research is conducted on the system and structure of the language and the relationship between the linguistic units is analyzed and since it is done with the method of functional linguistics, the context is taken into consideration in addition to the form and structure. Words were not categorized according to their types alone, but their types were determined according to their functions in the text. Moreover, since the study is based on the synchronic method, a description of a linguistic feature at a certain point in time has been made. Therefore, the research is limited to the works of three poets of the 16th and 17th centuries and does not focus on the changes in the language in the course of history, because this is the domain of the diachronic method. Only sometimes, when determining the etymology of semantic units, the meanings of affixes are given, but their changes in the course of history are not discussed. Since the study is not based on prescriptive linguistics, it does not evaluate language use in terms of correctness and incorrectness and does not propose any method for word construction. The aim of the study is to describe the morphological, morphosyntactic and morphosemantic features of the linguistic units.

The semantic analysis of the words in the study is based on the semiotic method. That is, the role of signifier and signified elements in the process of adding a dependent morpheme (affix) to an independent morpheme (word) is considered and analyzed. This evaluation is based on three criteria: morphological criteria, semantic criteria and morphosyntactic criteria. Morphosyntactic analysis is the analysis that takes into account the function of morphemes in the sentence. In morphological analysis, morphemes are analyzed only in terms of form, while in morphosyntactic analysis, morphemes are analyzed in terms of function and context. For a better understanding of the types, functions and functions of affixes, it is not enough to know their morphological features, but it is necessary to know the context of the words in which these affixes are added in the text.

This study consists of an introduction and two chapters. In the first part, information about morphemes is given and the concepts of derivational morpheme and prefix are explained. In the second part, information about the prefix “ra-” is given and the semantic category of this suffix is explained morphosemantically in six subtitles. It has been determined that this suffix adds the following meanings to the words to which it is attached:

Within the framework of these results, these recommendations can be made for this field of study: Derivational morphemes of Upper Kurmanji are semantically multifunctional. The same affix gives different meanings to words depending on the textual context. Therefore, in word construction and derivation studies, general statements such as “this suffix gives this meaning” should be avoided and such analysis should be done with the functional method, not the formal method. In this way, the semantic functions of suffixes will be better understood.

Çavkanî/References

- Adak, A. (2015). *Despêka edebiyata kurdî ya klasîk*. Weşanên Nûbiharê.
- Ahanov, K. (2021). *Dil bilimin esasları*. M. Ceritoğlu (Ed.). Türk Dil Kurumu Yayınları.
- Akçataş, A. û Varol, Ç. (2021). Türkiye türkçesinde isimden isim yapan eklerin morfo-semantik işlevleri. *Kesit Akademi Dergisi*, 7(26), 410-427.
- Aydın, M. (2014). *Dilbilim El Kitabı*. İstanbul: Akademik Kitaplar.
- Bauer, L. (2004). the function of word-formation and the inflection-derivation distinction. In H. Mike & L. Rod (Ed.). *Words in their places. a festschrift for j. lachlan mackenzie*. (283-292). Publicaties Vrije Universiteit.
- Bloomfield, L. (1935). *Language*. Publicaties Allen Unwin.
- Botî, K. (2006). *Ferhenga Kamêran (Kurdî-Kurdî)*. Spîrêz.
- Cizîrî, M. (2019). *Dîwan. T. Î. Doskî* (Amd.). Weşanên Nûbiharê.
- Delikaya, Ö. (2016). *Peyvsazî di kurmancî de: Nêrineke giştî*. (Teza Lîsansa Bilind). Zanîngeha Bîngolê. Enstîtuya Zimanên zindî.
- Demirci, K. (2008). Dilbilgiselleşme üzerine bir inceleme. *Bilig-Türk Dünyası Sosyal Bilimler Dergisi*, 0 (45), 131-146.
- Evdulfettah, D. (2011). *Kar (Lêker)*. Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê.
- Feqî, T. (2017). *Feqîyê teyran jîyan, berhem û helbestên wî* (Amd.). M. X. Sadîni. Weşanên Nûbiharê.
- Feqî, T. (2021). *Feqîyê teyran (dîwan)*. A. Kardeniz (Amd.). Weşanên Nûbiharê.
- Guzev, V. (2010). Söz dizimi birimleri üzerine. *Türk Dili Araştırmaları Yıllığı-Belleten* (56 2008/2).
- Hamawand, Z. (2011). *Morphology in english word formation in cognitive grammar*. Continuum International Publishing Group.
- Hatipoğlu, V. (1974). Türkçedeki eklerin kökeni. *Türk Dili Dergisi*, 29 (268), 331-340.
- Kerim, A. H. (2019). *Kürtçenin etimolojik sözlüğü (karşılaştırmalı)*. Weşanên Arê.
- Kurdo, Q. (1981). *Zimanê kurdî-rêziman (gramatîk)*. Weşanên Komkarê.
- Malmisanij, M. (2013). *Kürtçede ses değişimi*. Vate Yayınları.
- Marif, E. H. (2000). *Rêzimanî kurdî (wişesazî) bergî yekem- beşê pêncem*. Weşanî Serdem.
- Muhammed, H. (2016). *Peyvsazî*. Çapa Elektronik. <https://zimannas.wordpress.com/2016/11/02/3073/>.
- Plag, I. (2003). *Word-formation in english formation*. Cambridge University Press.
- Sarı, İ. (2015). *Türkçede ekleme dışı sözcük yapımı*. (Doktora Tezi). Hacettepe Üniversitesi. Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Sebzecioğlu, T. (2017). *Dilbilim kavramlarıyla türkçe dilbilgisi*. Kesit Yayınları.
- Stekauer, P., Valera, S. ve Körtvelyessy, L. (2012). *Word-formation in the world's languages*.: Cambridge University Press.
- Tek, A. (2018). *Hamisiz şâir babasız metin*. Weşanên Nûbiharê.
- Tîgrîs, A. (2011). *Pêşkî û parkî*. Weşanên Medyayê.
- Toklu, M. O. (2009). *Dilbilime giriş*. Akçağ Yayınları.
- Turan, Z. (2018). Türk dilinin eklerini sınıflandırmanın esasları. *Türkbilig Dergisi*, (35), 97-110.
- Usman, N. S. (2015). *Morfolojiyê Dariştinî Wişe le Zarî Hewramî û Kurdî Nawerast*. Zankoyî Selahadîn.
- Uzun, E. N. (2006). *Biçimbilim*. Papatya Yayıncılık.
- Varol, Ç. (2022). İsimden isim yapan –ci ekinin morfo-semantik işlevleri. *Uluslararası Toplumsal Bilimler Dergisi*, 6(1), 270-290.
- Xanî, E. (2014). *Mem û zîn* (Amd.). N. Açıkgöz. Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları.

Ahmet SEYARİ

Pêşgira Dariştinê ya “ra-”yê û Fonksîyonên Wê yên Morfosemantîk di Berhemên Klasîk ên Kurmancîya Jorîn da

Yıldırım, K. (2014). *Ehmedê xanî külliyyatı IV*. Weşanên Avestayê.

Yozgat, U. (2018). Dilbilimde biçimci ve işlevci düzlem. Di nav de Can, Ö. (Ed.). *Dilbilim kuramları iki düzlem beş kuram*.(33-76). İthaki Yayınları.

Zaxoyî, Î. R. (2007). *Ferhengê pêşkên kurdî*. Weşanên Spirezê.

Zilan, R. (2006). Paşgirên kurdî-I. *Kurmancî (Rojanameya Taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîse)*, (36), 9-12.

Zivingî, M. E. (2013). *Gerdeniya gewherî şerha dîwana melayê Cizîrî*. Weşanên Avestayê.